



Makale Geliş Tarihi: 06.02.2018

Makale Kabul Tarihi: 05.08.2018

TEMSÎLÊN ROMANÊN DÎROKÎ YÊN ELİYÊ EVDILREHMAN

Cumhuri Ölmez¹

KURTE

Di vê xebatê de em ê li ser temsîlên romanên Eliyê Evdilrehman yê dîrokî bisekinin. Temsil, ji bo derbirîna eleqeya di navbera nivîskar û îdeolojiya wî de hatiye vegotin. Em ê ji bo temsîlan mînakên xwe ji *Xatê Xanim*, (1959) *Gundê Mêrxasan* (1968) û *Şer Li Çiya* (1989) bistînin. Di vê çerçoveyê de *Romana Dîrokî*, *Edebiyata Mêldar û Realîzma Sosyalîst*, *Dîskura Netewî*, dê ji bo xebata me bibin paşxaneyên teorîk. Bi vê xebata xwe em îddîa dikin ku helwesta Eliyê Evdilrehman ya îdeolojîk û rewşenbîrî sînorên edebiyata wî teng dike, girêdayî vê yekê ji berhemên wî ji metnên edebî zêdetir wek belgeyên dîrokî xuya dikin. Ji ber nêzîkbûna wî ya îdeolojîk, temsîlên leheng û dijminahiyê, îdealîzekirina tîkiliyên kurdan bi netewên wek ermen û azerîyan, derveyî rastiyên dîrokî tîkî temsîlîkirin. Dîsa ji bo netewperwerî û nasnameya kurdan, avakirina hafizayeke kolektîf, di berhemên nivîskarî de hewldanek eşkere heye. Armanca xebata me ew e ku em bi van temsîl û meseleyên dîrokî xwendineke nêzîk bikin û sînorên van romanên yê edebî, siyasî û fikrî binirxînin.

Bêjeyên Sereke: Eliyê Evdilrehman, Edebiyata Mêldar, Ideolojiya Sosyalîst, Dîskura Netewî û Nasname

¹ Zanişgeha Mardîn Artukluyû- Xwendekarê Mastera Çand û Zimanê Kurdî, cumhurnemir@gmail.com

ÖZ

Eliyê Evdilrehman'ın Tarihi Romanlarındaki Temsiller

Bu çalışmada Eliyê Evdilrehman'ın tarihi romanlarındaki temsilleri üzerinde duracağız. Temsil kavramı ideolojik açıdan yazarın eserleri ile olan bağımlı açıklamak üzere dile getirilmiştir. Sözkonusu temsilleri belirtmek için "Xatê Xanim" (1959), "Gundê Mêrxasan" (1968) ve "Şer Li Çiya" (1989) romanlarından istifade edeceğiz. Bu çerçevede "tarihi roman", "tarafli edebiyat", "sosyalist gerçekçilik" ve "ulusal söylem" çalışmamızın teorik arka planını oluşturacaktır. Bu çalışma ile Eliyê Evdilrehman'ın ideolojik, entelektüel duruşunun O'nun edebi ufkunu sınırladığını, buna bağlı olarak eserlerinin edebi birer metinden ziyade tarihi birer belge gibi görüldüğünü iddia etmekteyiz. Yazarın ideolojisinden dolayı kahraman ve düşman temsillerinde, Kürtlerin Ermeni ve Azerilerle ilişkilerinin idealizasyonunda, tarihi gerçeklerden uzaklaştığı görülmektedir. Yine milliyetçilik ve Kürt kimliğinin oluşumu için kolektif bir hafıza oluşturma çabası yazarın eserlerinde karşımıza çıkmaktadır. Çalışmamızın amacı, işlenen temsil ve tarihi olaylarla tematik bir okuma yapmak ve bu çerçevede eserlerin edebi, siyasi, fikri sınırlarını ortaya koymaktır.

Anahtar kelimeler: Eliyê Evdilrehman, tarafli edebiyat, sosyalizm ideolojisi, ulusal söylem ve kimlik.

ABSTRACT

Representation in Eliyê Evdilrehman's Historical Novels

In this article, we analyze Eliyê Evdilrehman's historical novels. We will do a thematic reading through representation and examples from Xatê Xanim [Lady Khate] (1959), Gundê Mêrxasan, [Land of Bravemen] (1968) Şer Li Çiya [Battle on the Mountains] (1989). In this framework, Historical Novel, Partisan Literature, Socialistic Realism and National Discourse are theoretic background for our article. In this article we claim that Evdilrehman's ideological and intellectual attempts restrict his literary borders. Accordingly, his works look like historical documents rather than literary texts. Because of his ideological approach and representation of characters and hostility and idealization of relations of Kurds with other nations such as Armenian and Azeris are represented out of historical realities. Even though, there are clear attempts in works of this writer for Kurdish patriotism and identity as well as for formation a collective memory. In this perspectives, we aim to do a thematic reading via these representation and historical themes and evaluate the literary, political and intellectual borders of mentioned novels.

Key Words: Eliyê Evdilrehman, Partisan Literature, Socialist Ideology, National discourse and identity

Destpêk

Romanên Eliyê Evdilrehman yê dîrokî ku bi perspektîfek sosyalîst û kurdewar hatine nivîsîn ji aliyê babetan ve pîralî ne. Bi dîtina me sedemê vê yekê ew e ku nivîskar di navbera îdeolojiya sosyalîzmê û nasnameya xwe ya kurdewar de dikeve dudilîyeke rewşenbîrî. Di gelek cihan de ev her du fikr li hev nakin û

nivîskarî mecbûrî tercihekê dîkin. Di encama vê tercihê de nivîskar dixwaze her du aliyan nêzîkî hev bike û wan di nava yekîtiyekê de nîşan bide. Ji ber vê hewldanê, îdealîzasyon û temsîlên nivîskarî ji asta rastiye derdikevin û ber bi senaryoyek bê bîngê ve diçin. Îdealîzekerina tîkiliyên kurdan bi ermen û ezerîyan, gotinek wek *tirkên kedkar*, pesindayîna welatê sovyetê, di encama terciha nivîskarî ya îdeolojîk de bi awayekî ji derveyê rastiya dem û buyeran tîm temsîlîkin. Ji ber vê yekê di bin sernavê *edebiyata mêldar, realîzma sosyalîst û romana dîrokî* û di berdewamiya wê de me qala sosyalîzmê û bandora wê ya li ser nivîskar û edebiyata wî kir. Em li wê baweriyê ne ku di dewama xebatê de temsîl û îdealîzasyonên nivîskarî bi riya vê paşxaneyê dê bêtir bîn fahmkirin.

Her wekî di nava xebatê de xuya dibe, di van romanên de edebiyata mêldar û îdeolojiya sosyalîzmê, dîskura netewî, welatperwerî, nasname, lehengî û mîrxasiya kurdan cihek berfireh digirin. Ji ber vê yekê, van mijaran berê me dane çavkaniyên cuda cuda û em mecbûrî xwendinek berfirehtir kirin. Di vî warî de hem jî bo paşxaneyê teorîk me berê xwe da îdeolojiya sosyalîzmê, gotara netewî û hem jî ji bo nîrxandina temsîl û îddîyên nivîskarî, me hin berhemênderbarê meseleyên dîrokî de raçav kirin.

Wek kêmasiyek zanistî bê dîtin jî di gelek cihan de ji şîroveyê zêdetir rasterast me gotinên nivîskarî neql kirin. Ev çend jî ji şewaza nivîskarî peyda dibû ku gotinên xwe bêyî ku hewceyî şîroveyê bin, rasterast vedigotin. Ji xwe şewaza nivîskarî ya rewşenbîrî, ku ji hunereke sembolîk-alegorîk dîr e, bi her awayî di berheman de dihate dîtin û di vê çerçovê de zêde hewcedarî bi şîroveyên berfireh nedibû.

Şert û mercên demê û nasnameya nivîskarî ya dibin bandora koçberî û xerîbiyê de ava bûyî, li ser milên berhemên wî dibin barekî îdeolojîk û ev çend wekî bendavekê rê li ber pêkhatina reng û teşeyên şewazeke hunerî-edebî digirin. Lê atmosfera dîrokî ya romanên wî aksîyonekê, heyecanekê pêk tînin û perçeyek be jî mirovî daxilî cîhaneke hunerî dîkin.

1. Edebiyata Mêldar, Realîzma Sosyalîst û Romana Dîrokî

Her wekî G. Lukacs dibêje romana dîrokî di destpêka sedsala 19mîn de, piştî xilasiya *Şerên Napolyon* (1805-1813) dest pê dike (Lukacs, 2008: 21). Ev şer li ser dîroka Ewropayê, li ser bîr û baweriyên împaratoriyê, her wiha li ser netewbûnê bandoreke mezin pêk tînin. Heman bûyer li ser jiyana Ewropîyan ya sîyasî, îktîsadî, civakî guherînên bîngêhîn çêdike û ev guherîn dibin sedem ku netewên Ewropî ji bo lêgerîna paşxaneyê dîrokî bikevin nava hewldanekê. Ji van lêgerînan a herî zêde bandorê li ser Ewropayê dike, fikra netewperweriyê ye. Ji ber van sedeman di vê dewrê de dîrok û rabirdûya netewî wekî tîgeheke netewperweriyê daxilî hişê mirovan dibin. Di vê çerçoveyê de di tîkiliya dîrok û edebiyatê de rûpeleke nû vedibe. Li gel vê perspektîfê edebiyat ji bo avakirina

dîrokeke netewî dibe amrazek û romannûsên wê demê jî romanên xwe bi gotara netewî dinivîsin.

Li Fransayê piştî şoreşê fikra netewî, li Almanayê fikra antîfaşîst, li Rûsyayê fikra sosyalist û li Tirkîyeyê jî fikra netewdewletê bûye bingeha nivîsîna romana dîrokî. Li gor Tûrkeş di edebiyata miletên bindest, kêmine û bêdewlet de romana dîrokî li şûna dîroka takekesî û civakî, îdeolojiya berxwedêr û tekoşer cih digire. Şi'ura nivîsandina romana dîrokî di edebiyatên van miletan de li ser rizgarkirina welatî ava dibe (Tûrkeş, 2008: 97). Li gor vê fikrê huner (meqseda me ji vê pênasê niha edebiyat e) hewce ye tenê rastiyan mirovahiyê vebêje û ji romantîzmekê dûr bikeve ku dibe sedemê têkçûna dîtina rastiyan. Her rastiyeke îspatê dixwaze û hewceye xwe bispêre belgeyan. Di vê çerçoveyê de teybetiya sereke ya romanên sosyalîst ên sovyetê ew e ku li ser rastiya belgeyan dîrokî hatine avakirin (Tûrkeş, 2008: 103).

Fikra sosyalîst ku bingeha xwe ji fikrên Marks, Engels û Lenîn hildigire, ne tenê meseleyeke îdeolojîk, di heman demê de meseleyeke hunerî, edebî, çandî ye jî. Piştî avabûna YKSSê (Yekîtiya komarên sovyetê yê sosyalîst) di serî de li Rûsya, Qafqasya û pişt re li gelek welatên cîhanê îdeolojiya sosyalist-komunîst deng veda. Her îdeolojî di geşadana xwe de xwedî îddiyan mezîn e. Ji bo mafên mirovan û azadiyê, ji bo desthilatdariyêke bi dad û wekhevîyê, gotinên xwe pêşkêş dike. Îdeolojiya sosyalîzmê bi destê Marx ku wek teoriyêke îktîsadî li hember kapîtalîzmê hatiye danîn, dûv re derbasî qadên mîna siyasî, çand û edebiyatê jî dibe. Realîzma sosyalîst teoriya van îddiyan tê qebûlkirin û di heman demê de wek teoriyêke edebî jî cihê xwe digire.

Derbarê meseleyê de Moran, pejirandina polîtîkayên partiyê, alîkariya marksîzmê û prensîba *partînost* ji bo nivîskarekî/e realist-sosyalîst wek şîarên sereke nîşan dide (Moran, 2012: 72). Dîsa Moran qala peywîr û şîarê dike ku bi têgehên wekî *proletkûlt* û *partînost* ve eleqedar in. Piştî *Şoreşa Oktoberê* (1917) ji bo danasîn û belavkirina fikrên şoreşê huner jî tevî vê macerayê dibe û *Partiya Bolşevîk* bi her awayî piştgiyê dide sazîbûna vê hewldanê. Nivîskarên wê demê yê Sovyetê tevî vê desteyê dibin û hunera xwe ji bo şoreşê dikin piştevanî. Wek saziyêke çandî-hunerî *proletkûlt* bi vî awayî derdikeve holê. Helbet ev alîkarî wek Akîf Kurtuluş jî îfade dike, ne yekalî ye û bi nêzîkbûna xwe ya germ ve piştgiyî *proletkûltê* ya ji bo şoreşê, dibe sedem ku partî bi hebûna xwe, herî zêde alîkariyê bide vê saziyê (Kurtuluş, 1996: 20).

Proletkûlt bi van daxwazên îdeolojîk sazîbûna hewldaneke çandî ye. Di navbera 1917 û 1920an de proletkûlt wek saziyê, peywîreke baş pêk tîne lê bi desthilatdariya Lenîn û pişt re jî hatina Stalîn, li vê saziyê zêde mudaxele tê kirin û proletkûlt ji bingeha xwe ya eslî dûr dikeve. Her çiqas ji bo fikrên şoreşê nivîskarên wê saziyê bi dildarî xebat kiribin jî piştî van mudaxelayên polîtîk nivîskar li hember t'edayî û yektîpkirinê (homojenîzekirinê) derdikevin. Di

encama vê nerazîbûnê de realîzma rexneyî derdikeve holêku Greogry Lukacs jî nûnerekî wê ye.

Di salên sovyetê yê ewil de li hemû Qafqasyayê, her wiha li Ermenistanê jî ji bo pêşxistina sosyalîzmê mafên milletên kêmine hatine parastin û ji aliyê meseleyên civakî, çandî û perwerdeyî ve ji bo pêşvebirina wan milletan hewldanên mezin pêk dihatin. Ev yek jî bandorê li ser nivîskarên kurd dike û metnên kurdên Qafqasyayê bi piranî di bin bandora vê îdeolojiya sosyalîst de tînin nivîsîn.

Derbarê vê bandorê de Ahmedzade di bin sernavên *Kurdiyên ewil: realîzma sosyalîst* de li ser bingeha avabûna van romanên disekine û dibêje ku; *Li yekîtiya sovyetan, piştî Şoreşa Oktoberê di sala 1917an de, ji ber ku kurdên li wê derê dijîyan dikaribûn ji hin mafên ziman û çandî istifade bikin, romanên kurdî yê ewil ji aliyê aktivîstên ku endamên Partiya Komünîst a Yekîtiya Sovyetan bûn, hatine nivîsandin* (Ahmedzade, 2011:18). Di dewama nivîsê de wek nimûneyên realist-sosyalîst li ser romanên *Şivanê Kurmanca* û *Pêşmerge* disekine. Eliyê Evdilrehman jî hewce ye li gor vê bingehe bê nirxandin. Ji ber ku temamiya temenê xwe li vî welatî û di bin bandora îdeolojiya sosyalîzmê de derbas kiriye.

Hewce ye bê diyarkirin ku di êwra Qafkasyayê de beriya Eliyê Evdilrehman, Erebe Şemo; Jiyana Bextewar, Hopo û Dimdim, Heciyê Cindî; Hewarî, Seîde Îbo; Kurdê Rêwî, Egîde Xudo; Dê û Dêmarî kême zêde li gor pîvanên romana dîrokî ya Sovyetê ev berhemên xwe nivîsandine.

Helbet nivîskarên kurd vê şeweyê ji edebiyata Sovyetê hildigirin. Di vê edebiyatê de ji bo bicihkirina îdeolojiya sosyalîzmê li gel helbesta ajîtatîf herî zêde romana dîrokî dihate karanîn. Di salên 1920an de di edebiyata Sovyetê de ev cure cihek sereke digire. Li gor van teybetiyan jî tîkiliya edebiyatê û dîrokê bêtir xwe nîşan dide.

2. Temsîla Îdeolojiya Sosyalîst

Çawa hemû nivîskarên kurd ên sovyetê di bin tesîra vê şeweya edebî de dimînin, her wiha Eliyê Evdilrehman jî belgeyên dîrokî di romanên xwe yê dîrokî de bi kar tîne. Lê bi ferqekê; nivîskar di nava romanên xwe de her çiqas propagandaya sosyalîzmê bike jî, serpêhatiyên kurdan, lehengî û tîkoşînên wan bêtir temsîl dike. Tecrûbeyê heyatê ya Eliyê Evdilrehman jî dişibe hevçaxên wî yê li sovyetê ku serpêhatiya wan a li wir bi koçberiyê dest pê kiriye.

Eliyê Evdilrehman piştî salên 1920an tevî gelek kurdan ji bajarê Wanê koçberî Yekîtiya Sovyetan dibe û jiyana wî li cihên wek Nexçivan, Ermenistan û Azerbeycanê derbas dibe. Di Şerê Cihanê yê Duyemîn de li hember dijminên Sovyetê li gelek eniyan de şer dike. Em di hevpeyvîna ku Tîmûrê Xelîl li gel nivîskarî kiribû, rastî van gotinan tînin: *Min çar sala di nava desta partîzanan da li dijî almanên şerbaz ber xwe da, tevî birayên xwe li dijî faşîstan cenga jiyîn-*

mirinê daniye û angorî hêza xwe jî nehîştîye wekî dijmin welatê me zevt bike." (Timûrê Xelîl, Neqqal Uzun, 1995: 387). Her wiha di sala 1960an de dibe endamê *Yekîtiya Nivîskarên YKSS'yê* (Evdilrehman, 2011: 15). Ev serencama rewşenbîr û nivîskar Eliyê Evdilrehman ya ku li welatê Sovyetê derbas bûyî dibe sedem ku ew hem ji aliyê îdeolojiyê hem jî ji aliyê huner û edebiyatê ve girêdayî fikra sosyalîst bibe.

Bi du awayan îdeolojiya sosyalîzmê di nava romanên Eliyê Evdilrehman de cih digire. Ya yekêmin; rasterast li pesnê vê îdeolojiyê dide, wek cihekî îdeal welatê sovyetê nîşan dide. Lehengî û mêrxasiya kurdan bi têgeha şoreşê ve girê dide. Bi riya hevrûkirinê, li gor welatên Tirkîye û Îranê, Sovyetan wekî warê biratî, wekhevî û 'edalatê nîşan dide. Disa li hember axa û begên feodal alîgirtina desthilatdariya Sovyetê ya ji bo gundî û feqîran bi berfirehî temsîl dike. Em dixwazin bi çend mînakên van gotinên xwe piştrast bikin.

Di romana *Gundê Mêrxasan* de dema kurdek bi navê Mehmet ku li Sovyetê bi cih bûye, bi serokê eşîran, Çolo re diaxive, wiha dibêje: *Welatê ûrisetê welatekî baş e. Padîşahê wê qanûneke wisa daniye, kesek ji xatirê kesekî nakeve, mîna bira dijîn. Li wir niha dest pê kirine xweliyê ji dewlemendan, axa û begleran distînin, didine gundiyan kesib. Karxane û fabriqeyan didine paleyan* (Evdilrehman, 2012b: 72). Em dikarin bibêjin ku seranserê vê pirtûkê îdealîzekirina fikra sosyalîzmê, şoreşê û welatê Sovyetê ye. Kurd ji daxwaza azadbûna welatê xwe zêdetir ji bo şoreşê şerî dikin. Nivîskar parastina vê fikrê di asteke ewqas bilind de vedibêje ku keçeke kurd ji bo şoreşê û îdeolojiya xwe li hember bavê xwe jî derkeve û şer bike. Dema Xezala keça Heso Begê -ku di romanê de Heso Beg wek feodalekî ye, li hember şoreşê ye û wekî xain tê temsîlkirin- di derbarê kiryarên bavê xwe de nameyekê ji serkarê şoreşker dişîne, serkar jî wiha bersivê dide wê: *Binihêre, qîza kurd û zêdeyiya li ser qîza dijminê cimaeta Şêwrê yê xedar çawa li miqabilî dijminan şer dike û ya sere, (muhim) li miqabilî bavê xwe yê helal. Belê li miqabilî bavê xwe...* (Evdilrehman, 2012b: 186). Kurdên ku ji ber zilma tirk û farisan reviyane welatê Sovyetê, li vir jî di nav şerekî de ne. Lê vê carê dijmin tê guhertin û li şûna zilma tirk û farisan *dijminên sinifê* derdikevin pêş me. Nivîskar tabloyek wisa nîşanî me dide ku kurd bi rastî jî bi hemû hebûna xwe, hêz û baweriyên xwe ve alîgirên sosyalîzmê ne û ji bo vê çendê bi dil û can bizavê didin (Evdilrehman, 2012b: 141).

Di vê çendê de em dixwazin bipirsin; gelo bi rastî jî nêzîkbûna Sovyetê ji bo kurdan bi vî rengî bû? Eliyê Evdilrehman dema ku welatê sovyetê li gel Îran û Tirkîyê muqayese dike wê wek bihuşteke nîşan dide (Evdilrehman, 2012b: 114). Dema em piçek li ser rastiyên demê bisekinin em ê bibînin ku çî eleqe bi bihuştûna Sovyetê nîn e. Bihuşt li rexekî ji bo kurdan bi sedan kul û derd, zehmetî û zordarî, sirgûn û kuştin, qirkirin derdikevin pêş me. Helbet ji salên destpêka avabûna Sovyetê heya demekê ji bo hemû kêmwelatîyan her wiha ji bo kurdan jî derfetên baş hatin dayîn. Lê ev çend têra berzekirin an jî kêmkirina

zilm û zordariyan nake ku li kurdên Sovyetê hatine kirin. Hejarê Şamîl di pêşgotina pirtûka xwe ya *Diaspora Kîrtleri* de, di derbarê vê mijarê de gelek agahiyan dide û ji îdealîzasyoneke hestiyarî dûr dikeve. Li ser têkbirina *Kurdistana Sor* (1923-1929) sirgûnkirina Sibîrya û Asyaya Navîn, zordestiyên desthilatdariya sovyetê; li ser qirkirina kurdên Azerbaycanê, feqîrî û bêîmkaniyên kurdan disekine (Hejarê Şamîl, 2005:13). Rewşenbîrek ku jiyana xwe di nav van şert û mercan de derbas kiriye çima tenê bi pesindayinekê nêzîkî meseleyê dibe? Ya rast ev rewş ne tenê di romanên Eliyê Evdilrehman de her wiha di berhemên hemû nivîskarên kurd ên Qafqasyayê de, bo nimûne di berhemên yekî wek Erebê Şemo de jî derdikeve pêş me. Derbarê vê meseleyê de Alan, piştî nirxandinek berfireh ya li ser rewşa edebiyata Qafqasyayê tespîtên xwe vedibêje û dihege vê encamê: *Bi min hêvîsikestina Şemo, eva duyemîn bû. Ew komunistekî bawermend bû, sedemê sirgûniya xwe ya 19 salan, wekî kiryareke şexsî didît. Sedemê wê, Stalîn, madem ji holê rabûbû, nexwe kêş û pîrsgirêkê jî çareser bûbû. Yanê sirgûnî, di Erebê Şemo de wek navbireke bêdil e; ne ezmûnek e ku mirov sewqî şik û guhertinan bike!.. An belkî jî di wijdana wî de minetdariya welatê duyem hebû; çawa be rejîma Sovyetê, wî û gelê wî ji muhaciriyê xelas kiribû, di mafên hemwelatîyê de nasnaveke wekhev dabû wan, fîlan bêvan...*(Alan, 2009: 199).

Em ji hevpeyvîna Eliyê Evdilrehman û Tîmûrê Xelîl dizanin ku wî di berhemên xwe yê din de jî fikrên xwe yê sosyâlîst, pesindana Sovyetê û şoreşê vegotine. Pirtûka *Dê* li ser serpêhatiyên kurdên Yekîtiya Sovyetê û jiyana wan a têr û tijî; *Gulistan* li ser Lenîn û Şoreşa Oktoberê; *Hebandin* li ser biratî û dostaniya gelên Sovyetê hatine nivîsandin. (Tîmûrê Xelîl, Neqqal Uzun, 1995: 387). Belê piştî nirxandinên me, tespîtên Alan û herî dawî zanîna naveroka berhemên din yê nivîskarîem dikarin bi rehetî bibêjin ku wek rewşenbîr û nivîskarekî, Eliyê Evdilrehman di berhemên xwe de jî ber îdeolojiya xwe ya sosyâlîst dev ji pesindayîna Sovyetê û nirxên wê bernedaye û ji bo îcrakirina minetdariya xwe gelek rastiyên dîrokî yê wê dewrê bînpê kirine ku bûne sedemê gelek êş û azaran li ser jiyana kurdan.

Ya duduyan; bi dîskura *tirkên kedkar* nivîskar dixwaze di nava tirk û kurdan de pêwendiyekê pêk bîne. Ji aliyê nivîskarî ve di temsîla dijminahiya tirkan de peyvên wek; *roma reş, tirkên zalim, dagirkerên tirk, zevtkarên romê, tirkên tirsonek, roma virrek, tirkên xwînmij* tên gotin. Hem li aliyekî rexneyeke tund, gotinên dijwar û li aliyê din jî tirkên kedkar ên hevalbend û bira hene. Em dixwazin bi riya çend mînakên vê mijarê berfirehtir bikin. *Elîqulî got, Şêx Zayîr, tu ne ku tenê hezkirî û mîrxasê neteweya kurd î! Tu wisa jî xilaskiriyê tirkên me yê jar î jî* (Evdilrehman, 2011: 181). Em dibînin ku nivîskar gelek çarvan û têkiliyê dide zorê û mînakên wisa pêşkêş dike ku ji rastiyê dûr dikevin. Dema serkarê leşkerê tirkan ji aliyê şervanên kurdan ve tê revandin nivîskar wiha vedibêje: *Çend rojan şûnve derheqê dizîna efserê tabûra romê ya li Wanê, Îdirê, Erdîşê di nava temamiya welatîyan de jî belav bûye. Çawa dîwanê û wisa jî gelê*

kurd her digot ku ew tenê şixulê Şêx Zayîr e. Di Kurdistanê de kurdan û tirkên kedkar bona wî şixulê mîrxasiyê û bi rûmet qurban didan, ên ku pez û dewar tunebûn weke qurban dik serjê dikirin (Evdilrehman, 2011: 207).

Em li vê baweriyê ne ku ev îdealîzekirin girêdayî fikrên nivîskarî yên sosyalîst in. Nivîskar di beşa yekem a romana *Şer li Çiya* de bi berfirehî qala *Serhildana 1925an* dike û piştî têkçûna serhildanê dema dewlet pêşengên tevgerê bi dar ve dike, wesiyetên wan vedibêje. Yek ji van wesiyetan ev e: *Tewfîq Beg wexta dardakirinê wîha got: Cenazê min nîşanê kurd û tirkên kedkar bikin, bila her kes bizanibe wekî min ne bona azadiya nefsa canê xwe û wezîfeyê, lê ji bona azadî û bextewariya neteweya xwe, kedkarên tirkan û neteweyên mayî şer kiriye û îro jiyana xwe didim! Bila bijî Kurdistan û serbestiya gelan!* (Evdilrehman, 2011:27). Gelo bi rastî jî çî eleqeya kesayetên ku pêşengiya *Serhildana 1925an* kirine bi hizrek wek *tirkên kedkar* heye? Nivîskar çima welatparêzên kurd wekî rewşenbîrên enternasyonal nîşan dide? Yek; Aîdiyeta vê dîskurê ya îdeolojiya sosyalîzmê tiştek aşîkar e. Îdealîzekirina karakterên serhildanên kurdan veguhestiye enternasyonalîyê. Ev temsîlên derveyî rastiyê ne. Ya duyan jî di derbarê vê têkiliyê de ku Eliyê Evdilrehman xwestiye nîşan bide, rastiyeke dîrokî nîn e. Ji ber ku *tirkên kedkar* li rexekê netewparastin û kurdayetiya serhildanê her tim di nava nîqaşekê de ye. Çavkaniyên netewperwer wek serhildanek netewî, yên oldar jî wek serhildanek olî nîşan didin. Bruinessen îddîa dike ku di nava sedemên serhildana Şêx Seîd de rakirina xilafetê xwedî roleke girîng e (Bruinessen, 2013: 108). Mebesta me ne ew e bikevin nav nîqaşa vê meseleyê. Dibe ku serhildanên kurdan wê demê xwedî dîskureke netewperest bin an jî nasyonalist bin lê wê demê em nikarin bibêjin ku kurd enternasyonal bûn û xilasiya hemû gelên bindest difikirin. Belkî tenê wek pîrsekê; gelo dibe ku Eliyê Evdilrehman ji bo fikrên xwe yên sosyalîst ev gotin kiribin amraz? Bersiva me erê ye.

Îdeolojiya nivîskarî dibe sedem ku leheng û jiyana romanên di nav sekûleriyekê de bin. Di *Şer li Çiya* de nivîskar di derbarê lehengê romanê Şêx Zayîr û malbata wî de agahiyên dide û meşrebê wî bi Şêx Evdilqadirê Gêlanî vegirê dide (Evdilrehman, 2011: 35). Her wekî em dizanin di nava çanda kurdan de malbatên şêxan berî her tiştî bi m'ewewiyat û pîrozîyêtên zanîn. Teqwa û ruknên Îslamî di nava jiyana wan de cihek mezin digirin. Lê hem di vê romanê hem jî di herdu romanên din de em qet rastî vê temsîlê nayên. Em di romanê de Şêx Zayîr ji şêxekî zêdetir wek şoreşgerekî sosyalîst dibînin.

Em dixwazin ji aliyek din ve sedemên vê tercîha nivîskarî şirove bikin. Ew jî têkiliya Eliyê Evdilrehman bi *Êzîdîtiyê* ye. Bi rastî jî rasterast belgeyek di destê me de nîne ku em êzîdîbûna nivîskarî îspat bikin. Lê ew dema ku Eliyê Evdilrehman li gel eşîreta xwe koçberî qafqasyayê dibe em dizanin ku ji herêma Wanê girseyek mezin ya Êzîdiyan ji ber zîlm û zordariyê koçberî qafqasyayê dibe. Di derbarê van bûyeran de Tosînê Reşît îddîa dike ku, piştî Şerê Cîhanê ye Yekemîn piraniya Êzîdiyên herêma serhedê tînin kuştin û yên sax dimînin jî

derbasî Ermenistan û welatê Sovyetê dibin. Nifşê yekem yê nivîskarên qaskasyayê zêde di bin bandora wan de dimînin ku ev bandor jî di berhemên wan de tê dîtin. *Berbang, Hewarî û Kurdê Rêwî* li ser van bûyeran ava bûne (Tosinê Teşît, Neqqal Erbay, 2012: 210). Hejarê Şamîl derbarê koçberiya Êzîdiyan de dibêje ku; piştî komkujiya 1914-1918ana li Tirkîyeyê, muameleya li hember ermenîyan hatiye kirin li kurdên Êzîdî jî tê kirin û wan salan ji ‘Entab, Qers û Wanê gelek Êzîdî koçberî Qafkasyayê dibin (Hejarê Şamîl, 2005: 88). Dîsa Thomas Boîs, di *Ansîklopediya Îslamê* de, li ser nivîskarên kurd ên li Ermenistanê wiha dinivîse: *Piraniya pîyonên vê meseleyê Êzîdiyên nexwende bûn û ew jî welatê Tirkîyayê koçber bûbûn. Fayde jî îşertên civakî yê demê hilgirtin. Hem jî bandora çanda Îslamê dûr bûn hem jî jirewşenbîrên kurd. Berhemên wan bi piranî îdeolojîk bûn û bi hunereke xwerû hatibûn nivîsîn* (Thomas Boîs, Neqqal Şamîl, 2005, r.205). Em dizanin ku ji bo edebiyata kurdên qafqasyayê *edebiyata sêwiyan* tê gotin û ev dîskur jî bingeha xwe jî sêwîxaneya li Nexçivanê hildigire. Nivîskar di *Gundê Mêrxasan* de wiha behsa vê çendê dike: *Bo weleh ev dîwana me ya Şêwrê dîwaneke baş e, xwedanê feqîr û belengazan e. Dibêjin di qezaya Nexçivanê de çend êtîmxane wekirîne, jî zarokên beran girtî heta yê givre tê de bê heq têne terbiyekirin û xwendin* (Evdîlrehman, 2012b: 157). Nivîskar di nava van serpêhatiyên pîralî de dîsa jî rasterast li dijî Îslamê gotineke tund nabêje. Hetta dixwaze îspat bike ku sosyalîzm ne li dijî Îslamê ye, tenê li dijî wan kesan e ku bawerîya miletî jî bo berjewendiyên xwe bi kar tînin û wan dixapînin. Dema rexneyên wekî ku sosyalîzm li dijî Îslamê ye tînin, nivîskar îtiraz dike û dibêje; *Mescît û dêr vekirîne, kî dixwaze diçe kî naxwaze naçe, lê pêşiya şêx û meleyan jî tu kesî nebiriye* (Evdîlrehman, 2012b: 157). Hetta van gotinan nisbetî kesên menfaetperest dike û dibêje ku ew kes jî bo desthilatdariyên xwe yê feodal van îddîayan dikin û rastiya wan nîne.

2.1 Têmîla Lehengên Erênî û Dijmînan

Berî ku em derbasî çawanîya temsîlên nivîskarî bibin hewce ye derbarê têgeha temsîlê de çend tiştan bibêjin. Temsîl di wateya tevgerîna li ser navê kesekî/ê an jî civakê de ye. Her wekî Zeyno Zeynep di nivîsa xwe de diyar dike; *Têgeha temsîlê bi wateya xwe ya herî nas bi temsîliyeta siyasî ve têkildar e. Lê belê jî bilî şeweyên pêşkêşkirina diyardeyên civakî û çandî yê qada zimana û estetîkî wateyeke duyemîn a din jî heye; teswîrkirin, resimkîrin, ango pêşkêşkirin* (Zeynep, 2008: r.19). Ev pêşkêşkirin bi riya lehengan pêk tê û niyeta nivîskar û avakirina teybetiyên lehengan bi hev re gelek eleqedar in. Ji ber ku Eliyê Evdîlrehman li gor pîvanên ekola realîzma sosyalîst berhemên xwe nivîsandine em ê bêtir li ser vê perspektîfê qala lehengan bikin. Di vê ekolê de nivîskar li gor fikr û ramanên xwe tîp û karakterên îdeal ava dikin û di heman demê de dibin alîgirên van tîp û karakteran. Teoriya realîzma sosyalîst bi temsîla tîpên îdeal, lehengên erênî û ji her aliyê ve serkeftî, fikr û ramanên xwe pêşkêş dike. Ew

kesê/a ku xwediyê teybetiyên temsîlê ye hêzên dîrokî û lehengî di kesayeta xwe de şênber dîke û di heman demê de bi teybetiyên xwe jî dibe mînamek erênî.

Moran dibêje ku; *hewce ye lehengek wisa bê temsîlkirin ku civak bixwaze wek wî be, rêzê jê re bigire û xweziyên xwe pê bîne. Civak gelek zilm û zordariyan dibîne û bi tena serê xwe riya çareseriyê, rizgariyê nabîne. Hewceyî bi birêberekî, zanayekî heye. Lehengê/a erênî di nava wê civaka ku ji wî alikariyê dixwaze, peywîra xwe ya dîrokî bi cih tîne* (Moran, 2012 r.61). Belê lehengên erênî di nava vê îdealîzasyonê de ji bo îdeolojiya sosyalîst dibin amrazek. Helbet ev îdealîzêkirin ne tenê ji bo îdeolojiya sosyalîst ji bo her cure fikr û baweriyên nivîskarî dikare bê gotin. Ji ber ku Eliyê Evdîlrehman ji xeynî fikrên xwe yê sosyalîst ji bo lêgerîna bingehek dîrokî, avakirina nasnameyek kollektîf jî teybetiyên lehengên xwe ava kirine.

Belê li gor nivîskarî ji bo avakirina nasnameyek kollektîf têra xwe sedem hebûn. Serpêhatiyên kurdan li welatê Tirkiye û Îranê, belavkirin, sirgûn û talanên li ser kurdan, perçebûna axa kurdan û gelek sedemên din... Dema daxwaza avakirina nasnameyekê armanca sereke be berî her tiştî hewceyî bi dijminekî heye. Ji xwe nivîskar wek rewşenbîrek kurd di vî warî de têra xwe xwediyê keresteyan bû. Daxwaza me ne ew e qala wan bûyeran û dijminahiyên li hember kurdan bikin. Gelo nivîskarî di vî warî de temsîl û mînakên xwe çawa diyar kirine? Bersiva vê pirsê dê bibe armanca me. Ji bo zelalbûna mijarê em dêbi riya mînakên ji romanên, şiroveyên xwe pêşkêş bikin.

Nivîskar ji aliyê kesayet, mîrxasî û başiyê ve li rexekî, ji aliyê ruxsarî, şeweyî ve lehengên kurdan ji yê dijminan cuda nîşan dide. Balkêş e ku em di çî cihan de rastî dijminek bedew, spehî nayên. Dema nivîskar melazimek nahiyeyê, teswîr dîke ku xerec û baceyê distîne, dibêje ku; *merivekî çavşas, diranqîl, porşûjîn, li ser maseyê wek bûmê kor dihate kifşê*. Dema ev mirov li ber çavê xwendevanan şênber dibe bê guman texeyula dijminahiyê dê bêtir bi cih bibe. Ji bo temsîlek berovajî vê, bo nimûne dema lehengê *Şer Li Çîya* tê teswîrkirin em rastî van gotinan tîn: *Şênîyê gund ku Şêx Zayîr çiqas xeber dida ewqas nêzikî Şêx Zayîr dibû, dora wî çît girtibû. Li bejn û bala wî ya tîtalî, halet, li qirma mawzer, tivinga piçûkçap, li bedewîtiya wî bi şaşmayî mêze dikirin* (Evdîlrehman, 2011: 170). Ev mînak alîgirtina nivîskarî nîşan didin.

Di romanên de em rastî hin gotinan tîn ku nivîskar raste rast bi dijminahiyekê li tirkên dinêre. Di her sê berhemên de, ku me nivîsa xwe li ser wan ava kiriye, gelek mînakên vê dijminahiyê hene. Bo nimûne ji devê Şêx Zayîr nivîskar van gotinan pêşkêş dîke: *Hey gelî kopekan, wexta ku hûn dikevin çetînayiyê di cî de dest bi lavayan dikin. Diya xwe dikine jina xwe! Lê wexta ku derdikevine firehtiyê wan gotinan ji bîr dikin, defa xwe çep lê dixin* (Evdîlrehman, 2011:80). Dîsa ji devê Xatê Xanimê em tirsonekî û vîzekiya tirkên dibihîsin (Evdîlrehman, 2012: 31). Di heman berhemê de ji bo temsîla ruhiyeta tirkên em rastî van gotinan tîn: *Xatê gote Zeynê; -çend zêran di destê xwe de bigire. Wexta ku tu bi*

serkarê wan re xeber dî, car caran jî zêran nîşanî wî bide. Ruhê tirkan di nava wan zêran de ye (Evdilrehman, 2012a: 67). Lêbelê nivîskar di her sê romanên xwe de jî mîrxasî û lehengiyên kurdan vedibêje. Bo mimûne Ji devê Şêx Zayîr mêhvanperwerî, mêranî û mîrxasiya wan dibihîzin ku dirok şahidiya wê dike (Evdilrehman, 2011: 178).

Nivîskar dixwaze bi awayekî kurdan di nav hûmanîzmekê de nîşan bide. Her çiqas dijmin esîrên kurdan bikujin, malên wan talan bikin jî kurd bi çî awayî wekî wan nakin û girêdayî kevneşopiyên bav û kalan dimînin.

Dibe ku mirov bibêje ev temsîl li gor şert û mercên dem û bûyerê dikare pêk bîn. Lê em li wê baweriyê ne ku hin temsîlên nivîskarî jî asayîbûnê derdikevin û ber bi nijadperestiyekê, şovenizmeke netewî ve diçin. Helbet ev gotinên dijwar hewce ye xwe bispêre rastiyeke. Li ser du mînak em dixwazin van îddiyên xwe destnîşan bikin. Di *Gundê Mîrxasan* de jî devê lehengê romanê Çolo em rastî van gotinan tên: *Ez tu caran gotinên apê Hecî Elî ji bîr nakim ku digot 'Etbara xwe bi tirkan neynin, tirk xayîn in. Qîzan nedine tirkan û ji wan qîzan neynin... Diqewime jina tirk paşê li xweşa zilêm nayê berde, zarokê nedine wê, eger zaroka kurdan bigihîje tirkan wextekî û bi şûn de ew zarok ê bibe qesasê serê kurdan* (Evdilrehman, 2012b: 28). Dîsa em dibînin ku nivîskar di romanê de jî devê tirkan jî bingeha vê dijminahiyê ava dike û bi wan dide gotin. Dema kurê serkarê bajarê Wanê di derbarê Şêx Zayîr de bi bavê xwe re diaxive, bavê wî wiha bersiva wî dide: *Lawo te aqilê xwe winda kiriye, tu dîn bûyî ku tu bûyî kurd ew şixulekî cuda ye. Here aqilê xwe berhevî serê xwe bike. Kurd dijminê me yê bav kalan in* (Evdilrehman, 2011: 62).

Di romanên nivîskarî de dîskurek balkêş heye ku ew jî *rom* e. Her wekî tê zanîn di nav kurdan de gotinek wekî; *bextê romê tune ye* heye. Gelo ev gotin bingeha xwe ji ku distîne, çima jî aliyê nivîskarî ve jî wek tercîhek û bi zanîn di her sê romanên de hatiye bikaranîn? Nivîskar dibêje ku berî hatina tirkan ya li Anatolyayê, li wê derê Vizantiya (Bîzans) hebû û tîkiliyên wan bi kurdan re ne baş bûn û zilm li kurdan dikirin. Piştî hatina tirkan heman zilm û zordarî berdewam bû. Ji ber vê çendê jî kurdan navê *Romê* di temsîliyeta zilmê de karanîn (Evdilrehman, 2011: 24). Helbet ev jî girêdayî niyeta nivîskarî ye ku ji bo avakirina hafîzayeke kolektîf temsîla dijminahiyê dike amraz.

2.2. Temsîla Tîkiliyên Kurd Ermenî û Azeriyân

Bihevrebûna kurd û ermenan ji ber sedemên coxrafîk û dîrokî xwe dispêre heyamek kevn û ev yek jî aliyê dîroknasan ve wek rastiyeke heta roja me hatiye/tê vegotin. Di derbarê vê çendê de Kutlay dibêje ku; *Tîkiliyên ermenî û kurdan yên dostaniyê xwedî heyamek mezin e. Ev tîkili di jiyana her du mîletan ya civakî û edebî de dibe xwedî cihê û ev yek jî derbasî berheman bûye* (Nacî Kutlay, Neqqal Erbay, 2012: r.213). Di dewama gotinên xwe de Kutlay wek mînak dîroknas Hakop Şahbazyan nîşan dide ku di sala 1911an de pirtûkek li ser dîroka ermenî û kurdan nivîsandiyê. Pirtûk jî xwediyê wê îddiyê ye ku

bihevrebûna ermenî û kurdan xwe dispêre bingehê gelek kevn û dîrokî. Her wekî tê zanîn li coğrafyaya ku azerî lê dijîn, kurd jî niştecih bûne û xwedî dîrokeke kevn in. Li Azerbaycanê li bajarên Laçîn, Kelbecer, Gubadli û Zengilan-ku ev bajarên Kurdîstana Sor bûn- û li Nexçivanê kurd jiyane (Hejarê Şamîl, 2005: 18). Ev rastiyan dîrokî li rexekî, gelo nivîskar çawa nêzikî vê mijarê dibe û temsîleke çawa radixe ber çavên me.

Eliyê Evdilrehman bi çend awayan temsîliyeta vê tîkiliyê pêk tîne. Yek ji van ew e ku nivîskar bi avakirina dîrokeke hevpar bingeha bihevrebûna kurd, ermen û azeriyan ava dike. Qedîmbûna vê jiyînê, biratiyê xurttir dike û ew îddiayên ku nivîskar bixwaze pêşkêş bike bi hêsantir cihê xwe digirin. Em di her sê romanên da rastî temsîla biratiya kurd û ermeniyan tên. Di *Gundê Mêrxasan* de ji ber ku bûyer demek şûnde derbasî welatê sovyetê dibe, azerî jî tevî vê biratiyê dibin. Bo nimûne; di *Şer Li Çiya* de nivîskar ne ji devê lehengekî, rasterast ew bi xwe bi xwe hestên xwe vedibêje: *Gelî û çiyayê incîliyê! Hûn ji mêj ve, di serê serî de; helwesta dîrok, xwelî, ruh û zimanê gelê ermenî yê birayê qedîm in. Lê di rojên giran de cînar xwe li cînarê xwe digire, bira xwe li birayê xwe digire. Û aha hûn jî bi dewr û sedsalan bûne sitare û piştavanên kurdên dilhela* (Evdilrehman, 2011: 18).

Awayekî din ew e ku nivîskar ji aliyê çarenûsê ve, ji aliyê serpêhatiyên ve kurdan bi van her du miletan ve girê dide. Yanî kurdan çawa ji destê tirk û farisan zilm dîtine her wiha ermenan ji destê tirkan; azeriyan jî ji destê farisan ev zilm û zordarî dîtine. Bi vî awayî li hemberî dijminekî hevpar, biratî û yekîtiyê pêk tê. Di *Şer Li Çiya* de nivîskar wiha qala serpêhatiyên ermenan dike: *Wekî sala 1915an xwînmêjên tirk bi milyonan ermenî qir kirine. War û wargehê wan hilweşandine. Talan û şelandin dane ser wan û ji xwe re birine. Bêînsaftiya nemirovane gihîştîye wê astê wekî goristan, heykelê kevnar, heta bibêjî deriyê ermeniyan hilweşandine, hedimandine* (Evdilrehman, 2011: 19). Dîsa di *Gundê Mêrxasan* de dema azeriyeke bi navê Kalikê Xoce bi Çoloyê kurd re diaxive di derbarê xwe de van gotinan dike: *Ey oxlim, oxlim! Ne îtiribsen, ne gezersen? Bîz de êle kara gun çox gurmîşik. Şukur bu gunumîze*² (Evdilrehman, 2012b: 87). Di heman rûpelê de berdewamiya axaftinê de mêrikê azerî dibêje: *Em cimaeta dîlarê pirranî ji zilma zevtkarên îranê reviyane vir. Kurê min, çolo! Bila hûn sax bin, me jî derdê dinyayê gelekî ditiye, dax di ser dilê me re hatiye kişandin. Lawo em miletê ezerî û kurd di qirnan de cîranên hev bûne û me bi hev re biratî kiriye. Me di roja hev a şahiyê û şîne de piştê hev girtiye, me bi tevahî li miqabilî dijminê xwe şer kiriye* (Evdilrehman, 2012b: 87).

Li miqabilî heman dijminî şerkirina pêkve di romanên nivîskarî de xwedî cihekî berfireh e. Ne tenê şerkirin, ji her aliyê ve alîkariya hevûdu û fedakariyeke dildarane tê temsîlkirin. Di demên koçberiyê, sirgûniyê û êrîşên dijminî de, ev

²Bi zimanê azerî: Hêy kurê min, kurê min! Te çi wînda kiriye, li çi digeri? Me jî rojên wisa yê reş gelek dîtine. Şukur ji vê roja me re! (Nişeya nivîskarî ji romana navborî)

milet alîkariya hevûdu dîkin û ruh û canê xwe datînin meydanê. Bo nimûne di dema komkujiya ermenan de Murtîla Begê Muksê, ku niha navçeya Wanê ye, bi her awayî piştgiriyê dide ermenan û gelek malên wan ji ber zilma tirkan direvîne û ji bo vê jî xwe dide ber gelek te'dayî û nexweşiyên (Evdilrehman, 2011: 291).

Nivîskar bi teybetî li ser komkujiya ermenan ya 1915an disekine ku bi destê dewleta Osmanî ve pêk hatibû û rola parastin û biratiyê dide kurdan. Di vê çendê de kurdan qet sûcdar nake û dibêje tirk di vî warî de gunehên xwe diavêjin ser situyê kurdan; ... *seba ser wî şuxulê xwe yê qirêj bipêçin, dest davêtin fêlbaziyên cuda ku kurdan û ermeniyên berî hev bidin, ew hev qir bikin, qeweta wan sist be û paşê herdu neteweyan jî têxin bin destê xwe. Hinek serekvanên tirk ên fêlbaz, wiha bersîva ermeniyên dida: 'Cendirme û leşkerên me bêqanûniyên wisa nakin. Em tirk û ermenî cînarên hev ên bi sedsalan in, me heta roja îroyîn ji wî neteweyî tu xirabî nedîtiye û em birên hev in. Gelo bira dikare birayê xwe bikuje û wî talan bike? Gelî birayên me yê Ermenî, wê nêrinê ji serê xwe bavêjin, ew şuxulê qirêj ê Kurdan e. Kurd tenê bi ser gundên Ermeniyên de digirin, mirovan dikujin, hebûna wan talan dîkin* (Evdilrehman, 2011: 262). Di meseleyê de ku ewqas nîqaş li ser tê kirin, nivîskar qet îmkanê nade sûcdarkirina kurdan. Gelo bi rastî jî wisan bû? An jî bi rastî jî tekiliyên li gel ermenan di wê astê de bûn ku nivîskarî ewqas baş nîşan dane? Em dixwazin li ser van pirsan bisekinin û bi vî awayî xwe bigihînin sedemên vê îdealizasyona nivîskarî.

Berî her tiştî meseleyeke hêjayî nîqaşê heye ku ew jî di komkujiya ermenan de rola kurdan e. Belê fermana vê bûyerê ne ji aliyê kurdan ve hatibû dayîn û ji xwe kurd ne xwediyên wê hêza iqtîdarî bûn. Lê ev yek nayê wê wateya ku di vê bûyerê de kurd ne xwedî sûc û gunehan in. Mebesta me ne sûcdarkirina kurdan an jî miletekî din e. Ji bo zelalkirina mijarê em dê çend agahiyan bidin. Beriya vê meseleyê di serhildana ermenan ya 1894an de ku li Sasonê pêk hatibû, padîşah ji bo serqutkirina serhildanê *Alayên Hamidiye* dişîne û bi vî awayî komkujiyeke mezin pêk tê (Bruinnessen, 2013: 117). Di demê Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, di axa Osmanî de girêdayî şerê li hember rûsan meseleya ermenan cihêkî mezin digire. Bi alîkariya rûsan ermen daxwaza avakirina netewedewletekê dîkin û li hember vê jî dewleta osmanî êrişî ermenan dike. Helbet ew axa ku ermenan daxwaz dikir ne tenê ya wan, her wiha ya kurdan jî bû. Mirov dikare bibêje ne ji wan kêmtir, belkî gelek zêdetir kurd li ser wê axê dijyan. Dîsa Bruinnessen îddîa dike ku; *Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de bi tevlibûna kurdan gelek ermenî hatin kuştin û gelek eşîrên kurd jî hebûn ku alîkariya ermeniyên dikirin. Lê şerê îstiklalê yê rojhilatê bêtir li hember ermeniyên bû ku wan daxwaza dewletek serbixwe dikirin. Ji ber ku kurdan (li hember ermennan) bi fikra parastina axa xwe şer dikirin, tevlibûna kurdan ya şerî tiştêk ji rêzê bû* (Bruinnessen, 2013: 120). Di derbarê vê mijarê de îddiyên cuda hene û her yek ji aliyê xwe ve û li gor baweriya xwe nêzikî meseleyê dibe. Ji bo alîkariya kurdan jî gelek belge hene û navek wek Murtîla Begê Muksê

bûye mijara pirtûkan jî. Prof. Î.A. Orbêlî bi berfirehî li ser Murtîla Begê Muksê û keda wî ya ji bo xilaskirina malên ermenan disekine, her wiha biratiya kurd û ermenan vedibêje (Orbêlî, 2011: 56). Dîsa rewşenbîr û rêveberên kurdan yê serdema avabûna Komara Tirkiyeyê li hember îddîyên *kurdan ermenî kuştine* derdikevin û bi fikrek netewperwerî mafdariya kurdan vedibêjin. Şerîf Paşayê ku di gelek peymanan de temsîliyeta kurdan kiriye li Konferansa Parîsê ya 1919an debi navê *Li ser daxwazên milletê kurd notayek* nivîsarekê pêşkêş dîke. Di vê belgeyê de em dibînin ku li hember îddîa û daxwazên ermenan derdikeve û wan bi dagirkirina axa kurdan îtham dîke (Göldaş, 1991: 257).

Belkî ji îddîyayekê wêdetir wek rastiyekekê, trajediya kurdan ya li Qafqasyayê bi serê xwe sedemê îtirazekê ye li hember vê îdealîzekirina nivîskarî. Hilweşandîna Kurdistana Sor, di şerê Ermenistan û Azerbaycanê (1988-1993) de rewşa kurdên Qarabaxê, bişavtina kurdên Nexçîvanê, ji 1937an a dema Stalîn bigire heta bi dehan sirgûn û belengaziyên kurdan, tenê çend mînakên berbiçav in. Belê di avabûna Sovyetê de ji bo milletên kêmine gelek maf hatibûn dayîn. Kurd jî, Ermenistan di serî de, li gelek cihan dibûn xwediyên hin derfetan. Lê li hember wan trajediyên me behsa wan kirin, ev derfet kême dimînin gelek.

Piştî van tehlîlan em vegehin ser nivîskarê xwe û sedemên îdealîzekirina wî ya di derbarê têkiliyên kurd, ermenî û azerîyan. Her miletek hewl dide ku xwe bispêre paşxaneyekê dîrokî ya pak û bêguneh. Li ser ruhê cîhanê gelek bûyer, komkujî, zilm û zordarî hatine kirin û helbet failên van bûyeran jî hebûne. Lê kême millet bi dilekî şikeştî kirinên xwe dipejirîne û vê çendê digihîjîne asta lêborînekê. Her wekî me diyar kiribû nivîskar ji ber fikrên xwe yê sosyalîst pesindana van miletan wek peywirekê dibîne. Dema nivîskar bi awayekî îdeolojîk nêzikî meseleyê dibe parastina fikrên wî ji edebîbûna metnê zêdetir xwe nişan dide. Helbet li gel *minetdariya welatê duyem* (Alan, 2009: 199) avakirina hafizayekê kolektîf û nasname di vê îdealîzekirinê de xwedî roleke mezin in. Jixwe li hember Tirkiye û Îranê netewparastin, nasnameya kurdî û îspata van fikran di berhemên gelek nivîskarên kurd de cih girtine. Di dawiyê de mijarê de em ê derbasî temsîleke nivîskarî ya din bibin ku ew jî temsîla jina kurd e.

2.3. Temsîla Jina Kurd

Şerê li hemberî mirovan li rexekî, ji ber şertên axa kurdan yê fizîkî, coxrafîk kurd her tim di nav berxwedanekê de jiyane û ev çend jî ne tenê di berhemên kurdan de her wiha di berhemên seyyah, dîroknas, mîsyoner û peywirdarên biyaniyan de jî hatiye vegotin. Ji ber cihê wê yê stratejîk û xweşiya wê, Kurdistan ji aliyê gelek millet û şaristaniyan ve di serdemên cuda cuda de hatiye îstîlakirin. Li miqabilê vê kurdan li ber xwe dane û welatê xwe parastine. Di encama van parastinan de hin bûyer û leheng hene ku mohra xwe li dirokê xistine û bi wî awayî ji bo zanistên wek dirok û edebiyatê bûne kereste. Rewşenbîr û nivîskar ji ber avakirina nasnameyê hevpar, hafizayekê kolektîf serî li van bûyer û kesayetên didin û di nava jiyana nîfşên nû de rojevê pêk

tînin. Temsila mêrxasî û lehengiya mêran tiştêk ji rêzê ye û ev temsîl ji bo xwendevanan zêde balkêş an jî derasayî nayê. Helbet ev nêrîn bêtir nêrîneke mêrane ye û bi sedan salan wek tradisyonekê cihê xwe girtiye û gihiştîye roja me. Mêr ji bo şer û pevçûnê, mêr ji bo roja teng û tengasiyê, mêr ji bo berxwedan û lihemberderketinê, mêr wek beranekî ji bo roja xwe li benda serjêkirinê, mêr û hwd... Helbet baweriyêke bi vî awayî di nava civaka kurdan de xwedî cihekî mezin e. Lê heke melese jin be rewş diguhere. Lehengî û serfiraziya jinê her tim bêtir balkêş bûye û cihekî xwe yê teybet di dîrokê de girtiye. Têkoşîna jinê ji bo nivîskaran dibe amrazek cuda û ev yek jî ji bo avakirina hesteke millî/nasyonal an jî îdeolojîk tê bikaranîn. Piştî van gotinan em binêrin ka Eliyê Evdilrehman di derbarê jina kurd de profileke çawa nîşanî me dide û teybetiyên van temsîlan çi ne? Em di berhemên wî de bi çend awayan rastî jinek îdeal tîn.

Berî ku em derbasî van temsîlan bibin hewce ye bi teybetî qala *Xatê Xanim* bê kirin. Ji ber ku nivîskar berhemê ji serî heta dawî li ser sekna vê jinê ava dike û roleke mezin dide wê. Ew rol di kesayeta *Xatê Xanimê* de, di birêvebirina civakê de temsîla jina kurd e. Piştî mirina mêrê xwe Têmurê Eliyê Îsa ku serokê eşîrên hêla Dêrsimê bû, ew rêvebirina eşîrê dixê destê xwe û bi serfirazî vê peywirê bi cih tîne. Komên civakî yê derdora Dêrsimê ji wê şêwrê distînin û ew bi aqilmendiya xwe wan ji şer û nexweşîyan xilas dike. Dema dewleta Romê ji ber xeracê kurê wê Sultan, dîl digire û sedemên şerî pêk tînin jî ew bi zanîna xwe ve hem kurê xwe azad dike hem jî kurdan ji zilm û şerê dewletê rizgar dike. Tiştê balkêş ew e ku bi biryara xwe dikare êlên kurdan li hev bicivîne û biryara şerî an jî aştiyê bide. *Elametiye bidine temamiya kurdan, bila esker û leşkerên xwe hildin, sibehê na du sibehê hema di berbangaya sibehê de hicûmî ser Ezîrganê û kelê bikin, ku Siltên sax û silamet ji kelê derxin û em ê ordiya Romê ya virrek kor û pûç bikin* (Evdilrehman, 2012a: 69). Nivîskar lehanga xwe li gor şert û mercên derasayî amade dike û wê her tim li ser piyan û bihêz nîşan dide. Ji bo selahetiya cimaetê ew xwe ji hestên dayîktiyê azad dike, bi sebr nêzîkî meseleyan dibe. Dîsa em dixwazin bibêjin ku li gel birêvebirina civakê de rola jinan, peydabûn û îmkana yekîtiya kurdan di vê berhemê de peyameke sereke ye.

Temsîlek nivîskarî heye ku em di her sê berhemên de rast tîn; *bavê xaîn û keça soreşger*. Di *Xatê Xanimê* de Zeynê û bavê wê Emîn Paşa, di *Gundê Mêrxasan* de Xezal û bavê wê Heso Beg, di *Şer Li Çiya* de Simbil û bavê wê Edo temsîlên vê dijberiyê ne. Zeynê û Simbil ji bo welatperwerî û hebûna kurdariyê, ji bo fikreke netewî ditêkoşin. Lê em dibînin ku Xezal ji derveyî herduyan din ji bo îdeolojiya sosyalîzmê, li miqabilî dijminên sinifê heta ku di nav van de bavê wê jî heye, şer dike (Evdilrehman, 2012b: 186).

Nivîskar ji aliyê mêrxasî û lehengiyê ve her tim jinan dişibîne mêran. Xasletên mêran li wan bar dike, heta ku di pevçûnan de wek mêrekî şer dikin, li ber xwe didin. Bo nimûne di *Gundê Mêrxasan* de lehenga bi navê Gogê li Riza Efendî

dixe, ku ew xaîn û dijminê kurdan e, bi hev re wek pelawanan hol dibin û di dawiyê de keviyekî li wî dide û wî perîşan dike, heta ku ew aqilê xwe winda dike (Evdilrehman, 2012: 47). Di roja miletê xwe ya çetin de ji bo azadbûna cimaetê jin wek mêran tivingê hildidin û bi wan re li hember dijminan şer dikin. Dema peywîra jinê şoreşgerî be ji aliyê fêdakariyê ve ew di asteke herî bilind de têt temsilkirin. Dema dijmin di şeran de zorê dide wan ew teslîm nabin, fîşenga xwe ya paşîn di serê xwe de berdidin, yan jî xwe ji ser çiya û zinaran diavêjin. Lehenga bi navê Simbilê dema dijmin di ser de têt bi slogana *Bila bijî Kurdistanê serbest û aza!* guleya paşîn li xwe dixwe û ji ser zinarê hol dibe, dimire (Evdilrehman, 2011: 313).

Meseleya îxanetê jî di berhemên nivîskarî de bi gelek mînakên cihêkî berfireh digire. Li hember vê civaka kurd qet wan efû nake û bi tundî wan ceza dike. Di *Şer Li Çiya* de temsîla dayikekê heye ku dema kurê wê ji ber îxanetê têt kuştin qet xemê naxwe û ewladiya wî red dike. Nivîskar vê redkirinê bi netewperweriya dayikê ve girê dide û bi vî awayî temsîleke îdeal ava dike. Ji devê dayikê em rastî van gotinan têt: *...hûn dixwazin wekî bêm laşê wî bibim, şukir ji Xwedê re, min ewladê mîna Memo serê dinê nexistiye û naxim jî. Binîhêrin, ew ewladê kîjan teleqreşî û tolê ye gazî wan bikin. Ew ewladê zilîmkar û decalan e, bila ew defn bikin* (Evdilrehman, 2011: 112). Merhamet û dilsojiya dayikê ji bo ewladan wek behreke bêbin e. Di gelek meseleyên dijwar de dilê dayikê ji ber wê rehm û merhametê xeletiyên ewladan efû dikin. Lê nivîskar, netewperweriya dayika kurd di asteke ewqas bilind de nîşanî me dide ku li hember cesedê kurê xwe dayik van gotinên li jor dibêje. Ka çawa atmosferên romanên li ser şer û pevçûnan, berxwedan û parastinan hatine avakirin, her wiha jin jî di nava vê atmosferê de dibin xwedî rol, û teybetiyên wan têt tayînkirin. Li gor nivîskarî jina kurd çawa dikare malê xwedî bike, zarokan bîne û jîndariya kurdariyê bidomîne her wiha dikare serkariya êl û eşîretan bike, wan bi rê ve bibe û li miqabilî dijminan şer jî bike (Evdilrehman, 2011: 23).

2.4. Temsîla Dîskura Netewî û Nasname

Piştî sedsala 19an bi pêşketina ramana netewperweriyê, di nava cureyên edebî de avakirina nasnameya netewî dibe xwedî cihêkî berfireh. Li gor Jusdanis di avakirina her miletê de peywirdarên vê fikrê ji bo pêkhatina nasnameya netewî daxwaza hin saziyan dikin. Edebiyat jî yek ji van saziyan e. Edebiyat wek ayîneya nasnameya kolektîf xizmetê dike û çîroka wê vedibêje (Jusdanis, 1998: 68). Helbet vê tecrubeyê li Ewropayê dest pê kiribû û ji wir jî belavî hemû cîhanê bûbû. Belê miletên Ewropayê demek şûn de ev tecrûbe li paş xwe xistin û li gor şertên xwe yên xweser naveroka edebiyatên xwe ji nû ve saz kirin. Berovajî vê nivîskarên ew miletên di meseleya netewbûnê de paş de mayîne ji bo avakirina nasnameyê kolektîf her tim edebiyatên xwe bi vê çarenûsê ve girê didin. Ji bo vê armancê di gelek cihan de nivîskar û siyasetmedar heman kes

in. Nivîskar gelek çarî berxwedanan dibin. Li gor wan çek, qelem û kursî ji bo heman mexsedê, ji bo azadiya welatî xizmetê dikin (Jusdanis, 1998: 27).

Wekî hemû milletên bindest ên cîhanê edebiyata kurdan jî di vî warî de bûye xwedî tecrûbeyeke xweser. Em dizanin ku di edebiyata kurdî de kulliyatek li ser vê bingeha netewî ava bûye. Têkiliya edebiyatê bi nasname û siyasetê bi Xanî dest pê dibe û heta roja me jî berdewam e. Li ser şopa Xanî, di edebiyata kurdî ya modern de Hacî Qadirê Koyî, Pîremêrd, Osman Sebrî, Qedrî Can, Cegerxwîn û heta Mehmet Uzun û gelek nivîskarên kurd girêdayî vê tradîsyonê, edebiyat ji bo fikrên netewî, avakirina nasnameyê kirine berdevk.

Kurdên qafqasyayê di vî warî de li gor perçeyên din ên Kurdistanê paş de dimînin û heya demekê di berhemên wan de welatê kurdan û nasnameya wan nayê dîtin. Piştî avabûna sovyetê kurd di bin tesîra fikra sosyalîst de dimînin û welat ji bo wan dibe Sovyet. Her wekî Tosinê Reşît neql dibe Thomas Bois ji bo salên ewil yê edebiyata kurdên sovyetê wiha dibêje: *Rast e, berhemên kurdên Yekîtiya Sovyetê bi kurdî ne. Lê di van berhemên de hestên netewî tune. Ji bo nivîskarên ji derveyî Sovyetê welat Kurdistan bû lê ji bo nivîskarên li Sovyetê welat gundê wan, Ermenistan an jî Yekîtiya Sovyetê bû* (Neqqal Erbay, 2012: 207). Di dewama nivîsê de Tosinê Reşît li ser sedemên vê îddiyê disekine li gor xwe hin tespîtan vedibêje. Li gor Reşît edebiyata kurdên Qafqasyayê li qadeke vala wergerê dest pê kiribû ku çî tîkiliya wê bi edebiyata kurdî ya klasîk û modern çênebûbû. Ev werger ji edebiyatên rûs û ermenîyan hatibûn kirin û van edebiyatan li ser edebiyata kurdî bandoreke mezin kiribûn. Ji ber vê bandorê di destpêka edebiyata kurdên Qafqasyayê de sosyalîzm, biratiya gelan û jiyaneke bextewar mijarên sereke bûn (Neqqal Erbay, 1996: 206).

Piştî salên 1960an di edebiyata kurdî ya Sovyetê de guherînên mezin çêbûn û hestên netewî, welatê kurdan, nasnameya kurdan bûne mijarên sereke. *Şoreşa Îlonê* ya li Başûrê Kurdistanê³ di vê guherînê de wek sedemê sereke tê dîtin. Ev şoreş di heman demê de di derbarê kurdan de, li Sovyetê jî dibe sedemê guherînên fikrî. Ji bo kurdên li Sovyetê ev şoreş di sala 1963an de dest pê dibe. *Partiya Baasê* êrîşî kurdan dibe û Yekîtiya Sovyetê bi awayekî eşkere piştgiriya dide milletê kurd. Ev alîkarî dibe sedem ku meseleya kurdan li *Neteweyên Yekbûyî* de bê nîqaşkirin. Ev pêkhatin kurdên Sovyetê bêtir nêzîkî nasmaneya netewî dikin û ew jî xwe perçeyek ji milletê kurd dihesibînin. Di vê dewrê de ji bo nivîskarên kurd ên Sovyetê têkoşîna kurdan û rizgariya welatî dibin mijarên sereke. Berî cureyên din, di helbestên Qaçaxê Mirad, Şikoyê Hesên, Fêrikê Ûsiv û Mîkaîlê Reşîd de ev mijarên karanîn (Neqqal Erbay, 2012: 208).

Belê piştî vê serencamê em ê careke din berê xwe bidin Eliyê Evdilrehman. Hewce ye berî her tiştîbê gotin ku nivîskarî berî van pêkhatinan di berhemên xwe de qala netewperwerî û nasnameya kurdan kiriye. Em di agahiyên di

³ Ev şoreş di 1961an de, li Iraqê, di dema desthilatdariya Abdulkerîm Qasim de bi pêşengiya Mela Mistefa Barzanî pêk hatiye.

derbarê nivîskarî de dibînin ku li gel çend berhemên wî novelek wek *Xatê Xanim* di sala 1958ande hatiye nivîsîn ku mirov dikare bibêje bi naveroka xwe ve vê berhemê qala nasnameya netewî û berxwedana kurdan kiriye. Ji xwe nivîskar bi xwe derbarê çapkirina pirtûkê û naveroka wê de agahiyan dide û wek tarîxa çapkirina berhemê 1958an destnîşan dike (Neqqal Uzun, 1996: 385). Dîsa *Gundê Mêrxasan* her çiqas sala 1968an hatibe çapkirin jî di pêşgotina berhemê de nivîskar dibêje ku wî di sala 1958an de dest bi nivîsîna vê romanê kiriye û sala 1965an jî temam kiriye (Evdilrehman, 2012b: 10). Wê demê tenê *Şer Li Çiya* (1989) dikare di vê çerçoveyê de bê nixandin. Jixwe ev romana ku li ser *Serhildana Agiriyê* ava dibe, ku piştî Serhildana 1925an di navbera 1928 û 1930an de pêk tê, li gor herdu berhemên din, ji aliyê parastina nasname û hebûna kurdan ve xurttir e. Ev çend nîşanî me dide ku nivîskar di warê fikra kurdayetiyê de naşibe nivîskarên din ên Sovyetê. Jixwe ew ji nivîskariya xwe zêdetir bi rewşên bîriya xwe tê nasîn.

Berî her tiştî berhemên nivîskarî li hember îddiayekê hatine nivîsîn. Îddiaya li ser nebûna nasname, ziman û hebûna kurdan. Heta ku ev li hember derketin hem di hevpeyvînên nivîskarî de hem jî rasterast di berhemên wî de tîr vegotin. Li gor nivîskarî gotinên dîroknivîsên tirkan yê di derbarê nebûna kurdan de hene ku kurdan wek *tirkên serê çiyayê* nîşan didin, dibêjin ku wan zimanê xwe yê zikmakî ji bîr kirine û dem wê bê ew dê careke din bi tirkî xeber bidin. Li miqabilî van gotinan nivîskar dibêje ku li Tirkîyê bi milyonan kurd hene, edebiyateke wan, çandeke wan heye û hewce ye zarokên wan bi zimanê xwe perwerde bibin û dewlemendiya dîroka wan jî di cihanê de bê naskirin (Neqqal Uzun, 1995: 385). Nivîskar di *Şer Li Çiyayê* bi berfirehî li hember înkare derdikeve û ji bo îspata hebûna kurdan gotinan serf dîke: *Tirk ku kurdan bikin tirk, navê "Tirkên Çiyayê" danî ser wê neteweya qedîm. Qaşo kurd di vî welatê de tune ne û tenê tirk hene, lê wan bi sedemên cuda cuda zimanê xwe yê "Tirkî" ji bîr kiriye. Heke ew neteweke cuda bûna, wêje û çanda wan jî wê hebûya... Helbet, dîrok dide kifşê wekî ew yek bi temamî îftiraya dîwana romê ye ku diavêje sitûyê kurdan. Hîn wextên berê herfên wê neteweyê hebûne, helbestvan û nivîskarên Kurdan bi wan nivîsîne, bi zimanê letîf xeber dane. Lê çaxa ku li rojhilata qedîm dîwana Mediyayê hebû, tirk li kû bûn? Dema ku pêrgamênta Silêmaniya di hate nivîsandin tirk li kû bûn? Dema dîroknasê sedsala heftan Moses Kagankatvesî kurdan di rêza gelê cihanê yê xwedî elifba û çanda bilind de dida kifşkirin tirk li kû bûn? Çaxa ku Şêx Adî serbestî û yekîtiya kurdan û Kurdistanê distira tirk li kû bûn?* (Evdilrehman, 2011: 24-25). Nivîskar ji bo ku cudatiya di navbera kurd û tirkan nîşan bide, cihê hatina tirkan destnîşan dike û dibêje ku artêşa tirkan ji Xizistanê, Mangolîyê û Asyaya Navîn kişiyaye ser Bîzansê, Ermenistanê û Kurdistanê. Di dewama gotinên xwe de nivîskar ji ber vê cudatiyê li ser meseleyek girîng disekine ku ew jî 'adet, rabûn û rûniştin û dîn e. Li gor nivîskarî ji her aliyê ve ev cudahî li kifşê ye lê ji xeynî dîn û baweriyê. Dîsa jî her çiqas misilmanetî di nav Kurdan de belav bûbe jî pareke kurdan

derbas nabe misilmaniyê û her wiha Şemsperestî û Êzdiyatî jî di nava kurdan de xwedî cihek mezin in. Li gor van tespîtan jî bi çî awayî dîn nikare bibe hîmê wekhevkirina kurd û tirkên (Evdilrehman, 2011: 24-25). Her wekî di serê van gotinan de tê dîtin nivîskar ji bo fikrên xwe paşxaneyê netewî destnîşan dîke û bi gotina wî; *Dîroka neteweya kurd xezîneya mêrexasî, serbilindî, siyanet, nav û namûsê ye* (Evdilrehman, 2011: 25). Dema em rastî van gotinan hatin nivîskarê Kovara *Jînê* Kurdîyê Bedlîsî hate bîra me. Bedlîsî li hember îddiyên *Daîreya Muhacîran* ku kitêbeke bi navê *Kürtler* diweşîne û îddia dîke ku kurd bêesl û binyad in, nivîsekê bi navê *Dehak Efsanesi* dinivîse. Bedlîsî dixwaze hebûna kurdan bi riya destana Kawayê Hesinkar îspat bike û li hember îddiyên di derbarê nebûna kurdan derdikeve (Bozaslan, 1985: r.190). Nivîskar bi îdealîzasyonê her tim kurdan di nav yekîtiyê de nîşan dide. Di roja kurdan ya teng û tengasiyê de tenê kurd hewar û îmdadê didin hev û hev ji dijminan xilas dikin, wan têk dibin (Evdilrehman, 2012b: 72). Dîsa em dibînin ku bi hawara Xatê Xanimê ji çend rexên Kurdistanê di nava demeke kin de alikariya şervanên kurdan dikare bigihije wan û wan ji rewşa zor rizgar bike (Evdilrehman, 2012a: 46). Li gel vê nivîskarê vê daxwaza xwe wek xweziyekê jî bi lêv dîke û dibêje heke yekîtiya kurdan hebûya dê welatê kurdan jî hebûya û wek welatên din şên û bedew bûya (Evdilrehman, 2011: 179). Gelo çî ye rê li ber vê yekîtiyê digire? Çima kurd nabin yek? Nivîskar di her sê berheman de jî bi gelek temsîl û mînakên serê xwe bi vê meseleyê diêşîne û sedemê herî zêde tê temsîlkirin jî îxanet e. Di warê îxanetê de jî em her tim axa û begên kurdan dibînin. Ji bo berjewendî û desthilatdariyên xwe yê feodal ev kesene xiyantê li netewa xwe dikin û dibin alîgirên dijminan. Dewlet jî bi ritbilindkirin û peywîra xerckomkirinê wan dixwe destê xwe û li ser serê kurdan dîke xwedan biryar. Bi vî awayî dewlet siyaseta birakujiyê dimeşîne û kurdan bi destê kurdan dide kuştin (Evdilrehman, 2011: 139-140). Her wiha dijminên kurdan dema têk diçin û sist dibin dest diavêjin olê û Quranê, şêx û mişayîxan (Evdilrehman, 2012b: 27).

Her çiqas nivîskarî nasname û hebûna kurdan, serhildan û lehengiyên kurdan wek mijarên sereke di berhemên xwe de raxistibin ber çavan jî em nikarin li gor pîvanên rojavayî yê netewbûnê nêzikî van temsîlan bibin. Belkî mirov ji bo netewbûna kurdan dikare qala tecrûbeyê xweser bike. Ji ber ku di temsîlên nivîskarî de serkar û pêşengên serhildanên kurdan serokên el û eşîran in û hin caran sedemên serhildanên wan ji bîreweriyê netewî zêdetir pîrsgirêkeke herêmî an jî meseleyê ekonomîk derdikeve pêş me. Bo nimûne di *Xatê Xanimê* de em wek sedemê girtina Sultanî nedana xeracê dibînin û çîrok heta dawiyê li ser vê meseleyê didome. Fahriye Adsay, di teza xwe ya masterê de bi berfirehî li ser temsîla nivîskarî ya *kurd* û *Kurdistanê* disekine û meqseda nivîskarî ya *tifaqa kurdan* wekî temsîlek herêmî ya *eşîrên Dêrsimê* nîşan dide û nediyariya sînorên netewe û xaka kurdan ya di berhemên nivîskarî de wekî pîrsekê radestî xwendevanan dîke (Adsay, 2013: 36). Li gor Hassanpour serhildanên kurdan yê li hember desthilatdariyên biyanî ji tevahiya Kurdistanê

zêdetir tenê girêdayî begên herêmi mane. Ji ber ku ji netewperweriya modern a çînen navîn cuda ye, têgeha *netewperweriya feodal* bê karanîn dê çêtir bibe (Hasanpour, 2005: 130). Lê helbet hin kesên wek Abbas Valî li hember vê gotinê derketin û îfrazên xwe pêşkêş kirin. Di van îfrazan de Valî bi her awayî netewperweriya kurdan wek netewperweriyeke modern nîşan dide û sedemên vê îddiaya xwe bi rastiya kurdan ya sosyo-ekonomîk û siyasî ve girê dide (Valî,2013: 32). Ji ber ku ne mijara me ye em naxwazin bêtir li ser vê meseleyê bisekinin. Tenê em hêjayî gotinê dibînin ku di temsîlên nivîskarî yên serhildan û têkoşînên kurdan de fikra netewî di nava hemû qadên civakî yên gel de belav nabe û bêtir girêdayî malbatên sereke yên eşîrên kurdan dimînin.

Encam

Di dawiyê da em dikarin bibêjin ku; Eliyê Evdilrehman, bi seknek rewşenbîrî hunera xwe ji bo îdeolojî û nasnameya xwe kiriye amraz û bûye yek ji pêşengên edebiyata mêldar di berdeewamiya edebiyata kurdî ya modern da. Li aliyê din ji berhemên nivîskarî bêhna vegotina destanên kurdî tê ku wek nimûne *Xatê Xanim* gelek li vê vegotinê tê û mirov kêmi jî be tameke edebî jê hildigire. Lê mixabin ew zexta îdeolojîk a Sovyetê li ser berhemên wî bi her awayî xwe nîşan dide. Ne tenê ji aliyê edebî ve ji aliyê fikrî ve jî sosyalîzmeke hişk derdikeve pêş me û ev yek jî di temsîla avakirina nasnameyêke kolektîf de dibe sedemê hin nakokiyên. Ji aliyê edebî ve ji metnên hunerî zêdetir em metnên dîrokî; ji romannûsekî zêdetir em siyasatmedarekî dibînin. Bi vî awayî ev metnên wî nikarin di nav edebiyateke payebilind de bîn nirxandin, tenê ji ber endîşeyên îdeolojîk hatine afirandin û Eliyê Evdilrehman jî li gor me tenê di vê çerçoveyê de dikare bê şirovekirin. Her çiqas têkiliya siyasatê û hunerê ji bo nivîskarekî kurd xetek bivênevê be jî ev çend helaliyê nade paşdamayîna edebîbûna metnê. Ji ber ku nivîskar ne bi tevger û çalakiyên xwe yên siyasî, bi huner û berhemên xwe yên têzewq û huner dikare xwedî cihek domdar û bingehîn be. Ji xwe îmkana edebîbûna metnê li gel peyamên siyasî-polîtîk heye. Yanî kêmasî ne siyasîbûna metnê ye. Metnek dikare bi naveroka xwe ve endîşeyên netewî bi şêwazek hunerî û edebiyateke payebilind vebêje. Xulase, Eliyê Evdilrehman li gel bikaranîna meseleyên tarîxî ku ji bo avakirina zêhneke kolektîf, îdeolojiya xwe ya sosyalîst û fikrên xwe yên netewî wan dike amraz, ne xwediyê endîşeyek hunerî ye û çengekî berhemên xwe şikestî dihêle.

Çavkanî

- Adsay, F. (2013). *Romana Kurdî (Kurmançî) ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname*, Zanîngeha Mêrdîn Artuklu, Teza Lîsansa Bilind.
- Ahmedzade, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname*, Stenbol: Avesta.
- Alan, R. (2009), *Bendname*, Stenbol: Avesta.
- Bozarslan, M. E. (1985), *Kovara Jîn*, Uppsala: Deng.

- Bruinnessen, M. V. (2013), *Kürdistan Üzerine Yazılar*, (Çapa 8.), (Wer. Nevzat Kırış-Bülent Peker-Leyla Keskiner-Halil Turansal-Selda Somuncuođlu-Levent Kafadar.) İstanbul: İletişim.
- Evdilrehman, E. (2012a), *Xatê Xanim*, Amed: Lîs.
- Evdilrehman, E. (2012b), *Gundê Mêrxasan*, Amed: Lîs.
- Evdilrehman, E. (2001), *Şer Li Çiya Şêx Zayîr*, Stenbol: Perî.
- Göldaş, İ.(1991), *Kürdistan Teali Cemiyeti*, İstanbul: Doz.
- Hasanpour, A. (2005), *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil*, (Wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündođan) İstanbul: Avesta.
- Hejarê, Ş. (2005), *Diaspora Kürtleri*, İstanbul: Peri.
- Jusdanis, G. (1998), *Gecikmiş Modernite ve Estetik Kültür*, (Wer. Tuncay Birkan) İstanbul: Metis.
- Kurtuluş, A. (1996), *Politika ve Sanat*, İstanbul: Avesta.
- Kutlay, N. (2012). *Kafkas Kürtleri-Kürt Edebi İlişkileri. İnatçı Bir Bahar*, (Ed. Vecdi Erbay) İstanbul: Ayrıntı.
- Lukacs, G. (2008), *Tarihsel Roman*, (Wer. İsmail Dođan) Ankara: Epos.
- Moran, B. (2012), *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, İstanbul: İletişim.
- Orbelî, Î.A. (2011), *Li Muksê Folklor ûJiyana Rojane*, (Amd. Sînan Hakan), Stenbol: Nûbihar
- Tîmurê, X. (1995), *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, (Amd. Mehmet Uzun) İstanbul: Tüm Zamanlar.
- Tosinê, R. (2012), *Sovyetler Birliğinde Kürt Edebiyatı. İnatçı Bir Bahar*, (Amd. Vecdi Erbay), İstanbul: Ayrıntı.
- Türkeş, A. Ö.(2011), *Romana Yazılan Tarih, Edebiyatın Omzundaki Melek*, (Amd. Zeynep Uysal) İstanbul: İletişim.
- Uzun, M. (2013), *Bir Dil Yaratmak*, İstanbul: İthaki.
- Vali, A. (2013). *Kürt Tarihi Kimliği ve Siyaseti*, (Wer. İbrahim Bingöl) İstanbul: Avesta.
- Zeynep, Z. (2008). *Wekî qadeke Şidetê Temsîl: Di Romana Tirkan de Kurd, Îsyan û Jin-I*. (Wer. Davut Özalp) *Zend*, (r.19-28)